



## Şîret û Alîkarî Di dema xetereya istiqbala zarokan û destdirêjiya cinsî

### Alîkarî ji bona zarokan di demên ku ku di bin talûkeya akût de ne

Parastina zarokan herkesê eleqedêr dike! Hûn difikirin, ku zarokek di xwedîkirinê de tê îhmalkirin, tade lê dibe yan jî destdirêjayiya cinsî lê tê kirin? Hûn ducanî ne û hûn difikirin ku hûnê nikaribin li pitika (dergûşa) xwe miqate bin û biparêzin û loma dixwazin wê/î bidin? Wê demê hûn dikarin li vir tekildariyên girîng û pêwîst bibînin û li gorî hecêdariyê dikarin bi wan re têkevin tekiliyê.

Li cihên ku xizmetên şêwirmendî û piştgiriya lê tên kirin piranî tenê bi zimanê almanî ne. Çend bajar henin ku vî karê xwe bi piştgiriya zimana fîker û wergervanan re birêve dibin. Mînak: li Hannover, Mintîqa Hannover an jî Wilhelmshaven.



Hemû malparên pêşkeş û Navendên Şêwirdariyê ku bi pirzimanî ne, me wan bi Alakê daye nîşandan



### Nîşane: Xizmetên wergêra ji bo jin û keçên ku penaber in

Ji bo Jin û Keçên penaberan hemû tesîs û Avahiyên Navendên Şêwirdariyê yê li Saksonyaya-Jêrîn (Niedersachsen) dikarin ji bo xizmetên Wergerê, ku bi taybetî bi pirsgerêkên Jinan girêdayî ne – hesabe xwe bi fature bigrin. Ger hewcêdariya we ji wergervanekî/ê hebe, hûn dikarin ji saziyê re bêjin – hemû malûmatên di derheqê Navendên Şêwirdariyê de (bi zimale almanî ye) li vê malparê ne > [www.worte-helfen-frauen.de](http://www.worte-helfen-frauen.de)

### Daîraciwanan li Saksonyaya-Jêrîn (Niedersachsen)

Daîraciwanan piştgirî, alîkarî û şêwirmendiyê di dema ku zarok di bin talukê de bin, dide. Gava ku daîraciwanan girtî be, (xizmetên acîl ji bo zarok û ciwanan) [Kinder- und Jugendnotdienste](#) – ku her saetê bi şev û roj vekirîye, hatîye avakirin.



Adresên daîraciwanan li Niedersachsen û Bremen: > [www.agjae.de](http://www.agjae.de)



Dema ku hûn bi rêya telefonê nikarin bigihêjin daîraciwanan; wê deme hûn dikarin bang polîs jî bikin. Xeta **Telefona Acîlê 110** her dem bê pere ye, bi telefonên destan jî.



### Çelqandin gefxwarin e ji bo jiyane! Alîkarî ji bo dê û bavên ku zarok bi hewar e

Hinek zarok gelek digrîn û carna gelek dirêj bi hawar in. We ji bo aşbûnê her tiştî ceribandîye: wek binê pitikê (dergûşê) pak e, zikê wî/ê têr e, hûn ew di himbêza xwe de dihejin an jî dilorînin, bes dîsa jî ew aş nabe û diqîre? Eger hûn betilîbin û xwe beçarê hîs bikin û nizanibin hûnê çî bikin jî – dîsa jî hewl bidin ku bêhnfireh bimînin! Tu carî zaroka/ê xwe zêde nehejin, ji ber ku hejandin û lebitandina zarokan dikare bibe metirsiya jiyane!



Pêşniyar û agahdariyên li ser tiştên ku dê û bav dikarin bikin, di vê belavokê de ye > "[Schütteln ist lebensgefährlich](#)" (hejandin metirsîna jiyane ye) – [www.sozialministerium.baden-wuerttemberg.de](http://www.sozialministerium.baden-wuerttemberg.de) bi tirkî jî, bi rusî û bi inglîzî

## Bawerî / Zayîna nediarkirî

Hinek dê mecbûr dimînin ducanîbûna xwe veşêrin û li dû zayinê xwe di wê rewşê de nabînin ku karibin li pitika xwe miqate bin. Ji ber vê yekê carna mecbûr dimînin zaroka xwe bidin der. "Zayîneke bibawerî" îmkaneke ji bo hemû jinan e, eger ev dixwazin bila zayîn neyê eşkere kirin. Di rewşek wusa de hûn dikarin pitika xwe bi metodên tibî û parastinî bînin dinyayê. Ger hûn bixwazin karmenden me dikarin li dû zayînê jî alîkarîyê bidin we. Dema zarok dibe 16 Salî, wê demê eslê wî/ê tê eşkerekirin. Şîrê û alîkarîyên tibî ku tê pêşkeşkirin bê pere an jî belaş e. Şêwirmendî li ser van mijara henin:



## Alîkarî li ser xeta telefonê ya (anonîm) bidizî

Telefona alîkarîyê bi navê "Ducaniyên Bêçare – bidizî û bi ewlehî" bê pere ye û bi şêv û roj her seat mîrov dikare bigehê wir. Jinen Dûcanî li wêdere dikarin alîkarî yê gelek xurt bigrin û li ser daxwazê ev dikarin bi riya wan navên Navenden Şêwirîye bistînin. Şêwirmendiya bi riya telefonê bi 18 Zimanan in:



**Telefon (0800) 40 40 020**



## Şêwirmendiya- Online

Li ser malpara > [www.geburt-vertraulich.de](http://www.geburt-vertraulich.de) de agahiyên girîn ji bo "Zayina bi Ewlekarî" hene û hûn dikarin zêdtir agahdariyê di derheqê pêşniyara alîkariyan û telefon alîkarîyê de bigrin. Ev malper bi zimane inglîzî û almanî ye, ji bona daxistinê > [belavoka agahdariyê bi gelek zimanan](#) jî heye.



Jê pêvê li ser online şêwirdariya-bêpere jî heye: jinen ducanî dikarin şêwirdariyê bi rêya e-mail û çêtê jî bistînin. Lê eger pêwîst be ew we dişînin navenda şêwirdariyên din jî. Ev hemû şêwirmend bi sondxwarin. Ev Şêwirdariya- Online bi gelek zimanan in.



## Şêwirdariya di dema aloziyê ya ducanîbûyinê de

Ducanîbûyinek ne jidil dibe pirsgirêkên gelek mezin ji bona jin û mêr. Agahdarî li ser opsiyonên piştgiriya aborî û yê din li navendên şêwirdariya ji bo di dema aloziyê ya ducanîbûyinê de hene. Ev alîkari ji aliyê şêwirmendin ku ji alî dewletê de hatinen naskirin tê dayin. Naveroka alîkarîye berfireh e. Naveroka alîkarîyê ji eşkerekirinê bigre kari hemû aliyên hiqûqî, tibî, fîzîkî û hisî yê ser kurtajê (jiberxwebirinê) jî be. Di dema alîkarîyê de nimuyên eşkere û zelal tê dayin û di stendina biryarê de jî piştgirî tê dayin. Li vir xebata wergerî hen in > [www.worte-helfen-frauen.de](http://www.worte-helfen-frauen.de) hûn dikarin serî lexin!



> [Lîstek ji adresên navendên şêwirdariya di dema aloziyê ya ducanîbûyinê de, ku ew ji alî dewletê hatinen naskirin, li Saksonyaya-Jêrîn](#)



Gelek agahdarî jî di malpera "[Ratgeber für Frauen bei ungewollter Schwangerschaft](#)" – henin, û ji bona bi zimane kurmacî jî: > [Şîreta jinên pê ducanî bûna nexwastî](#) binere [www.ms.niedersachsen.de](http://www.ms.niedersachsen.de)

## Selika pitikan / Qutiya pitikan

Ji bo jinên ku zarokên xwe bidizî tînin dinyayê li Saksonyaya-Jêrîn navend henin; hal weha li wêderê jinên ku zarokê/a xwe anîne dinyayê, lê naxwazin bihewînin, dikarin zarokê/a xwe bi awayeke bidizî (anonîm) bidin. Ev "Babykörbchen / Babyklappe" (Selika pitika / Qutiya pitikan) gelek caran li nexwêşxanan de tînin dîtin. Bi wê awayê ku dema zarok (pitik) tînin danîn doktorek an jî pîrikek bi riya sînyalekê jê agahdar dibe, ku ew jî derhal eleqêderî zarok dibin. Hûn dikarin wê biryara xwe cardin jî bifikirin. Helbet hûn dikarin biryara xwe biguherînin û qerarê bidin ku zarokê/a xwe cardin bigrin. Ev biryar li dû dayîna zarok jî kari bê dayîn.



### Braunschweig

#### Babykörbchen im Marienstift

Helmstedter Str. 35 (Kilîniika Jinan aliyê bakur)  
38102 Braunschweig  
Telefon (0531) 701 13 04



### Hannover

#### Babykörbchen am Friederikenstift

Humboldtstr. 5 (Kilîniika Jinan li pişt Xanîvde Calenbergerstraße 40)  
30169 Hannover  
Telefon (0800) 605 00 40  
> [www.notruf-mirjam.de](http://www.notruf-mirjam.de)



### Nordhorn

#### Babyklappe am Haus des Sozialdienstes der katholischen Frauen (SKF)

Bentheimer Str. 33  
48529 Nordhorn  
Telefon (05921) 858 70  
> [www.skf-nordhorn.de](http://www.skf-nordhorn.de)



### Osnabrück

#### Babyklappe am Kinderheim St. Johann

Johannisstraße 39 bis 40  
49074 Osnabrück  
Telefon (0541) 33 87 70  
> [www.skf-os.de](http://www.skf-os.de)



### Rotenburg (Wümme)

#### Babykörbchen am Diakoniekrankenhaus

Elise-Averdieck-Str. 17 (Deriyê sereke li milê rastê, li pêşberî parka erebeyan)  
27356 Rotenburg (Wümme)  
Telefon (0800) 111 0 111



## Şewirdariya tendurustiyê ji bo jin û zarokan: Navenda şewirdariya destpêkê

Li Saksonyaya Jêrîn de sê bingehên navendên tendurustiyê yê " Navenda Şewirdariya Destpêkê " henin. Di demên hevpeyvînavekirî de mirov dikare li ser mijarên tendurustiya jin û zarokan alîkarîyê wergire. Pisporek li wir li gora hewcêdariyê pêşniyar dikin jî an sazîkin ku tedawîya tibî ji we re bê dayîn, an ku pêwîst be we dişînen cihekî din. Li vir mirov dikare; ji bo nexweşiyên ne pir giran, li ser pirsgêken xwarin û şewirmendiya li ser meseleyên jinan, wek mijare" Tîpîk Jin" û herweha di babeta tade û zordestiya li ser jin û zarok de alîkarîyê bigrin. Wergirtina van şewirdariyan û alîkarîyan bê pere ye. Peçvevan dikarin ji bo we wergerînin. Navenda Tendurustiyê ji aliyê hemşîreyek jibo zarokan-malbat û dîsa Pîrika malbata ve tê birêvebirîne. Hal weha eger pêwîst be, ev dikarin werin mala we jî.



### Zentrale Frühe Hilfen Verden Beratungsstelle im Containerdorf am Kreishaus

Lindhooper Str. 67  
27283 Verden

#### Demên Axaftine:

Duşem ji Seat 11.30an heta 13:00an  
Çarşem ji Seat 14.00an heta 15.30an  
Pêncşem ji Seat 08.00an heta 09.30an



### Zentrale Frühe Hilfen Bad Gandersheim Gesundheitszentrum "Zentrale Frühe Hilfen"

Stiftsfreiheit 14  
37581 Bad Gandersheim

#### Demên Axaftine:

Duşem ji Seat 10.00an heta 12:00an  
Seşem ji Seat 15.00an heta 17.30an



### Zentrale Frühe Hilfen Wilhelmshaven Gelände des Klinikums

Friedrich-Paffrath-Straße 114  
26389 Wilhelmshaven  
Telefon (04421) 98 84 255

#### Demên axaftinê:

Duşem û Çarşem ji Seat 15.00an heta 17.00an  
Seşem û Pêncşem ji Seat 09.00an heta 11.00an



> [Pelaagahîyan](#) (almanî, inglîzî, erebî, farsî)

## Şîret ji bo dê û bav, zarok, malbat û cîranan

Gelo mirov di dema jiyana malbatê ya rojane de dixeriqe, an jî di mijara perwerde de bêçare bimîne çî bike? Zarok dikarin telefonî kudere bikin eger êw bêçare bimînin? Gelo dema we wek cîran tiştêk dît lê hûn emîn nînin, gelo hûnê malûmat bidin kudere?

## Telefona dilgiranî ji bo malbata û zarokan – tenê bi almanî

Anonîm û beleş e ji bona telefonên destan jî: Dema hûn di jiyana malbatê di rojane de dixeriqe bûn an jî di mijara perwedekirinê de bêçare bimînin, wê demê hûn dikarin alîkarî li ser Xetamalbata bigrin. Li wêdere jî dê ji bo pisporên li navendên şewirdariya ji bo şewra şexsî ser seqam didin we. Zarok û ciwanen dilgiran dikarin alîkarî li ser Xetazarok- û ciwanan bigrin:



### **Xetetelefonamalbaten (0800) 111 0 550**

Duşem heta Inî seat ji 09:00an heta 11:00an

Seşem û pêncşem seat ji 17:00an heta 19:00an



### **Xetetelefonazarokan- û ciwanan (0800) 111 0 333 und 116 111**

Duşem heta şemîye seat ji 14:00an heta 20:00an

## Alîkarî & piştgiriya navendên şewirdariyê li Saksonyaya-Jêrîn – tenê almanî

Li Saksonyaya Jêrîn de gelek navendên şewirdariya henin, ev ji bo keç û zarokên ku mexdûrên şidetê an jî destdirêjiya cinsî bûnin in. Eger pêwîstî hebe zarok, ciwan û herwiha dîsa malbat jî dikarin herin wêderê û alîkarî û şewirmendiye werbigrin. Şewirmend bi we re li çareseriyekê digere ku ji bo parastina zarokê/a ye digere û gavên din li ser van mijare we nîşana we dikin. Di bûyera destdirêjayiya cinsî de we li ser tiştên ku di doza gilîkirîne de dikare biqewime agahdar dikin. Li hinek navendên şewirîye de tenê alîkarî yê hususî didin kêçik û malbaten wan. Wergirtina van agahdarî û şewirdariyan hemû beleş e, li gora daxwazan ev anonym e û bi zimane almanî ye.

Hemû adresên (navnîşanên) navendên şewirmendiye:



> [www.kinderschutz-niedersachsen.de/adressdatenbank](http://www.kinderschutz-niedersachsen.de/adressdatenbank)

Ev Lêgerîna-adres-onlinê-tenê bi almanî heye.

## Alîkarî ji bo zarok û ciwanên pêner di pirsgirêkên derûnî de

Ji bo Zarok û ciwanên pêner (û dê û bavê wan) şewirdariya-taybet henin:



### **Netzwerk für traumatisierte Flüchtlinge in Niedersachsen e.V. (NTFN) / Komeleya ji bo pênerên trawmatize bûne li Saksonyaya-Jêrîn**

Ev Komele alîkarî û şewirdariyên xwe bi gelek zimanan dide:



Psychosoziales Zentrum für Niedersachsen (Navenda psîkososyalî li Saksonyaya-Jêrîn)  
Marienstraße 28  
30171 Hannover

#### **Seaten axaftinê:**

Duşem û Inî ji Seat 10 heta 14

#### **Seaten axaftinê ji bona zarok û ciwanan:**

Her yekemîn Çarşema ya Mehe ji Seat 14:00an heta 16:00an

Qeydkirin li wêder pêwîst e: [a.schueppler@ntfn.de](mailto:a.schueppler@ntfn.de) an jî Telefon (0511) 85 64 45 25



Bi ci awayî ev seatan axaftinê yê terapiya zarok- û ciwanan dihewîne dikarin alîkarî bide, di ve belavokê de tê şrove kirin (bi [Elmanî](#), [Inglîzî](#), [Fransîzî](#), [Erebî](#) û [Persisch](#)) bine [www.ntfn.de](http://www.ntfn.de)



### Xeta-krîzê:

Şewirdarî dema krîzê de bi zimane erebî, kurdî, inglîzî û almanî

**Telefon (0511) 85 64 45 10**

Înî ji Seat 17:00an heta 19:00an



### Rêberî ji bo Dê û Bavê Zarokên pêneran

Ev Pirtukarêberî "Wie helfe ich meinem traumatisierten Kind?" ji bona Malbatên bi zarokên pêner in, yê ku ew dixwazin zanibin gava ku zarok tiştên nebaş dîtibe û ji bo wî/wê re alîkarî pêwîst be ye, hatiye amadekirin. Di vê pirtukarêberî de mirov dikare hemû agahiyan li ser zarokên ku trawma bûnin û li gora temenên xwe radigirin û gelo bê dê û bav dikarin bersiveke rast nîşan bidin, bibînin. Ev Pirtukarebêberî ji > [www.bptk.de](http://www.bptk.de) dikare were daxistin bi [Elmanî](#),



[Inglîzî](#), [Erebî](#), [Farsi](#) û [Kurdî](#) online: > [Rêbera ji bo dê û bavên penaberan](#)

### Li ser pirsê sunetkirina keçan

Li Almanyayê jî, keçik di bin rîska pirsê sunetkirina keçan de dimînin. Agahdarî û alîkariyê li ser vê mijarê li vir henin:



### Belavoka agahdarîyê di çarçeve berxwedana li dijî sunetkirina keçan

Belavok mijara ku pirsê sunetkirina keçan şirove dike û agahiyan li ser paşxaneyasîrove, encamên wê û motîvên wê ji bingehe de malumat dide. Mîrov dikarin di dawiya vê belavokê de têkiliyên giring bibîne, ku ew bi şîret û alîkarî û şewirdarîyê li ser vê mijare bide. Ev belavok dikare bê daxistin, bi [Elmanî](#), [Inglîzî](#) û [Fransîzî](#) bine > [www.sozialministerium.baden-wuerttemberg.de](http://www.sozialministerium.baden-wuerttemberg.de)



### Xeta-acîlê ji seba sunetkirina keçan – tenê almanî

Jin û kêç lê herweha mirovên din ên xwedî delîlên şênber ku di derheqê xeteriya keçikan de ye dikarin serî li xeta-acîlê ya ji rewşa awarte yê însîyatîfê bidin "SOS FGM". Ew li wir dikarin şîretên anonîm û bidestxistina piştgiriya tibî, derûnî û civakî û herweha alîkariya hiqûqî bibînin:



**Telefon (01803) 76 73 46**

Duşêma heta Pêncşêma ji Seat ji 10:00an heta 13:00an

Inî ji Seat 12:00an heta 19:00an

[info@taskforcefgm.de](mailto:info@taskforcefgm.de)

> [www.sosfgm.org](http://www.sosfgm.org)



### Telefona-alîkarîyê ji zordariya li dijî jinan

Telefona-alîkarîyê "Gewalt gegen Frauen" (zordariya li dijî jinan) xizmeteke şewirmendiyê ya wêk dewletî dikin, ku ji bo keç û jinên ku zordariyê dibînin an jî hîna di bine zoradriyê de ne, ye. Le dîsa xizm, heval û dostên wê jî dikarin li ser xeta pêwendiyê alîkarî bistînin. Şîret ji aliyê karmendên zanê û perwerdekirîne tê dayin. Hinik mînakên mijaran ev in: zordariya zayendî pirsê sunetkirina keçan, tunddîtiya nav malê. Herwiha ew dikarin berdewamkirina piştgiriya



herêmî jî bidin. Girtina Alîkariyê li vir beleş, anonîm e û bi 17 Zimanan tê dayin. Mirov dikare her Seat bigehejê:



**Telefon (08000) 116 016**



> [Pirtukarebêrîye bi 17 Zimanan](#) bine [www.hilfetelefon.de](http://www.hilfetelefon.de)

> [www.hilfetelefon.de](http://www.hilfetelefon.de) – Ev Malpera Telefona-alîkarîye bi pirzimanî ye (inglîzî, fransîzî, tirkî, rusî, spanyolî). Li ser malpere dîsa şewirdarî wêk **şewr liserxetê** jî heye, bi çêtan jî bi e-mail, bes **tenê bi Elmanî ye.**



## Navenda şewirmendiya navçandî

Komela Tekildayina Navçandî, Koçberî û Penaberan, şewirmendiyê li ser gelek mijara didin, mînak zoradarî li dijî jin û keçan, îstîsmar û destdirêjayiya cinsî, zewaca bêdil û bi zorê û zêdetir. Wergirtina alîkarîyê li vir belaş e. Hemû malûmaten di derheqê şewirdarîye li ser vê malperê bi gelek zimanan tînin, herwuha bi inglîzî, fransîzî, rusî, kurdî, erebî û tirkî:



kargah e.V.

Zur Bettfedernfabrik 1

30451 Hannover

> [www.kargah.de](http://www.kargah.de)

Dema ku Hûn ziman nizanîn û ji we re werger lazim be, ev komela dikare ji bo we wergervan jî temîn bike. Ev Servîs tenê li bajare Hannover û mintiqa Hannoverê heye:

Telefon (0511) 12 60 78 16 oder [sprachmittlung@kargah.de](mailto:sprachmittlung@kargah.de)



## Telefona-krîzê li dijî zewaca bi zorê

Keç û Jinên ku di bin gef û metirsîna zewaca bi zorê dene an jî di rewşeke zewaca zorê de dijîn, dikarin li Saksonyaya-Jêrîn li ser telefona-krîzê li dijî zewaca bi zorê alîkarî bigrin û agahdarî bidestxin. Ev dikarin tekiliyê bi rêya telefonê yan jî bi e-mail deynin. Wergirtina alîkarî li vir belaş e û eger pêwîst be anonîm e. Li vir bi zimane almanî û tirkî tê axaftine, bes eger pêwîst be farsî, erebî û kurdî (kurmancî) jî hene:



**Telefon (0800) 0667 888**

### Seatên Axaftinê

Duşêm heta Pêncşêm ji Seat 09:00 heta 16:00

Înî ji Seat 09:00an heta 13:00an

[zwangsheirat@kargah.de](mailto:zwangsheirat@kargah.de)

## Şîret û alîkarî dema destdirêjîya Cinsî

Eger hûn gumankirin ku zarokê/a we an jî zarokek ku nêzîkî we ye dibin îstismara cinsî de ye, ev bûyer ji bo mirov şokek mezin e. Gelek caran zexmete mirov ji vê yekê bawer bike. Lê hîn zexmetir e, gava sûcdar nasekî/e dê û bavê zarok be an jî ji malbatê bi xwe be. Ev zanîn carana mirova dikare bike nava hestekî bêçaretîyê, bêhêziyê û metirsîne, hisên sûcdariyê û şermîniyê an jî hêrsbûyinê derxe holê. Eger tiştek waha hebe gelo hûn dikarin çî bikin? Li vêderê hûn dikarin hinek rênîşanan li ser vê mijarê û di gûmankirinê de bibînin.

## Di derheqê destdirêjîya cinsî de divê hûn çi bizanibiyana

Destdirêjîya cinsî şidet e; bi rêya cînsî tê kirin. Carina miroveke mezin an jî ciwan ji bona tatmînkirina hewcêdariya xwe ya cinsî, bi zorê êrîşî li ser laşê zarokê/î dikin. Li vir ew mirov pozisyona xwe ya bihêzî yan jî nezanebûna zarok ji xwe re bi kar tîne.

Kêm caran tê dîtin ku sûcdar mirovekî/e xerîb e, berovajî ev nasê zarok e. Destdirêjîya cinsî hema hema her tim ji aliye sûcdar ve baş tê plan û amade kirin.

Ev êrîşanan di destpêkê de bi piranî bi awayek bê acizkirinê dest pê dike lê pişt re zêde dibin.

Ji ber sedemên merivî û nêzîkbûna bi sûcdar re, ji ber hestên xwe bi xwe sûcdarkirin, şerm an jî bêhêziya xwe ev zarok nikarin li ser bûyerên ku hatinin serê wan bipeyivin. Lê dîsa jî ew zarok gelek caran îşaretêk dide mirovan ku rêwşa wî ne baş e, tişteke ne normal qewimîye; mînak xuyakirina guhertinên di herekêta zarok de. Le nîşanên zelal yê destdirêjîya cinsî tune.

## Çawa hûn dikarin piştgirî bidin zarokên maxdûr

Bi baldarî bişopînin û guherandinên li ser helwest û hereketa wê/î û sînyal û îşaretê wê/î bi cidî bigrin!

Dema zarok bi bawerî nêzîkî we bibe û îşaret û alametê da we, ji wê/î bawer bikin. Yeqînî bidin wê/î, jê re bejin ku tu sûcê wê/î tê de tune ye û tu kes nikare bi wê/î tiştêk weha bike.

Nîşanî zarok bidin ku hûn ew guhdarî dikin, lê zêde bi ser de nerin.

Serba parastina zarok binêrîn û bifikirin bê yekemîn gavên hevbeş bihev re çi ne.

Her ciqas ji bona we zor û zehmet be jî aram bimînin.

Tu carî bi van gumanên xwe bi tena serê xwe nemîn in, herin û ji karmenden pîspor ên ji navenda şewirmendiyê alîkarî bistînin! Li wêderê ji bona şopandina bûyerê hûn dikarin alîkariyê bibînin!



## Materyalên ji bo zarokan

Pirtuk an jî materyalên ji bo zarokan, dikare di destpêkê de bibe alîkariyek ji bona bi zarok re, ku li ser vê mijarê bi axaftinek dest pê bike – her ciqas hûn dixwazin piştgirî bidin wê/î zarokê/î, sebare ew xwe bi kîjan şeklî dikare biparêze jî, ev materyal caran acête girîng e. (Agahiyên kêrhatî yê bo zarok) "Tipps für Kids" hene. Mînak: ji bona ku zarok xwe bi xwe li dijî tacîzê çawa xwe biparêze. Ev agahiyên kêrhatî ên ji bona keç û kuran ji aliye Navenda Şewirdariyê li Kölnê "zartbitter" şewirmendiyê didin hatîye amadekirin; bine malpera > [www.zartbitter.de](http://www.zartbitter.de) bi gelek zimanan hatîye wegerandin.